# Rapora YASA ya mehane
## Navenda Kurdî ji bo Lêkolîn û Rawêjkariya Yasayî

## Sibat 2010




**YA§A e.V.**

Kurdish Centre for Legal Studies and Consultancy

Kurdisches Zentrum für juristische Studien und Beratungen

Navenda kurdî ji bo lêkolîn û rawêjkarîya yasayî

المركز الكردي للدراسات والاستشارات القانونية

**YASA e.V.**
Postfach 7624
53076 Bonn
www.yasa-online.org


## Hesen Salih

# Naverok:


**Dadgeha Leşkerî li Qamişlo zindan li serkirdeyê Kurd ê PYKS Hesen Salih birî**
**Kurdek ji ber azarîkirinê di girtîgeha navendî ya Helebê de jiyana xwe ji dest da**
**Li Xalid Gênco zindan hate birîn**
**Ewlekariya Komarê li Qamişlo du welatiyên Kurd binçav kir**
**Dadgeha Leşkerî li Qamişlo şeş meh zindan li çar welatiyên Kurd birîn**


**Dadgeha Leşkerî li Qamişlo zindan li serkirdeyê Kurd ê PYKS Hesen Salih birî**

Di roja Sêşemê 16.02.2010an de dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo salek zindan li endamê Komîteya Siyasî ya Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê Hesen Salih birî. Ew bi endamtiya komeleyeke nihênî û qedexe û arandina kînên zam û nijadperestî hate tewanbarkirin. Paşê sezaya wî ji salekê daket heşt mehan. Di heman civatê de şeş meh zindan li Şehbaz Nezîr Ismaîl û Siwar Ebdil Rehman Derwîş hate birîn. Ew bi belavkirina belge û weşanên Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê hatin tewanbarkirin. Paşê sezaya wan ji şeş meha daket çar mehan.

Tê zanîn, ku di 20.12.2008an de vedorgerîneke ewlekariya tewankariyan li Qamişloyê êrîşî dikana Siwar Ebdil Rehman kiri bû. Ew wî çaxî bi behaneya hebûn hin bûjen û kelemelên qaçax derbasî dikana wî bû bûn, û hinek weşanên Partiya Yekîtî zeft kiri bûn. Paşê Siwar ji bo Ewlekariya Siyasî hati bû guhastin û li wir goti bû, ku ewî ev weşan ji Şehbaz Nezîr Ismaîl, ku firoşgeha wî ya berçavikan heye, wergiritne. Şehbaz jî bi wê tewanê hate binçavkirin û paşê eşkere kir, ku ev weşanên bi riya Hesen Salih gihane wî. Li dawiyê Hesen Salih jî li ser vê çîrokê erê kir.

**Kurdek ji ber azarîkirinê di girtîgeha navendî ya Helebê de jiyana xwe ji dest da**

Komîteya Sûrî ji bo Mafên Mirov di daxuyanekê de ragihand, ku welatiyê Kurd Mihemed Misto Reşîd ji bajarê Efrînê ji ber azarîkirinê di girtîgeha navendî ya bajarê Helebê de jiyan xwe ji dest daye. Komîteya ragihand, ku ew ji beriya çar mehan ve hati bû girtin û baş hati bû azarîkirin û paşê ji bo nexweşxaneya Himyat li Helebê hati bû guhastin. Pişt ku ewî çar salan di nexweşxaneyê de borand, careke din kete zindanê de û di 19.01.2010an de nûçeya mirina wî hate ragihandin.

**Li Xalid Gênco zindan hate birîn**
Di roja Duşemê 08.02.2010an de dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişlo çar meh zindan û 80 hezar leyreyên Sûriyê li Xalid Mamo Gênco birî. Xalid Gênco ji ber pêkanîn peymana Sûrî-Elmanî, ya derbarê vegerandina penaberên Sûriyê li Elmanya, hati bû vegerandin.

**Ewlekariya Komarê li Qamişlo du welatiyên Kurd binçav kir**
Di roja 18.02.2010an de hate ragihandin, ku Munteser Ehmed Xelef, yê ku li Amûdê xwedanê firoşgeheke Computeran e û weke wênekêş kari dike û Alan Ehmed Hisên, ku ew jî li Amûdê xwedanê firoşgehek gul û kulîlkan e, bêyî belegeyên girtinê, ji aliyê vedorgerîneke girêdayî Ewlekariya Komarê ya bajarê Qamişlo hatin binçavkirin. Heya aniha sedemên girtina wan ne diyar in.

**Dadgeha Leşkerî li Qamişlo şeş meh zindan li çar welatiyên Kurd birîn**
Hate ragihandin, ku dadwerê tek ê leşkerî li bajarê Qamişli şeş meh zindan û 100 Leyreyên Sûriyê li Elî Mihemed Masûm Mamo, Sala Hisên Ehmed, Mihemed Newaf El Mihemed û Bengî Şêx Mûsa Şêxmûs birî. Ew bi arandina kînên zamî (tayifî) hatin tewanbarkirin.